



ENCÛMEN



Ji weşanên Nivîsgeha çand û Ragihandina Encûmena niştimanî kurdî

Weşanên siyasî - çand - huner - civak - wêje

Sernivîs-Yusra Zibêr

Lêvegera Ziman- Mihemed Kose

Ji bo têkiliyên We bi Me re

Li ser Amêlê

Rojname.enks@gmail.com

Jmar 4



ENCÛMEN



Dîrok: 8 / 7 / 2018

1

jmar(4)

Di

seranserî



Dr.Mihemed salih cum'a

mêjûwa xebata meyî xwînavî dastanîyî pir dirêj de her û her Hovberên Sawdar û Da şên Serdarên Turk, Erebi û Faris ji bona Koletî û Bendîtîya Miletê me û Talankirina Dewlemendîtîya Welatê me Kurtêlxwer, Hestîkoş, Xwefiroşên mîna Caş û Daşên 66 û 16. 10. 2017 di nava Welat me de û di nava Civaka Kurdistan me de bi mîna gurên devbixwînên har bi dijî Milet û Welatê me ve ji xww re her û her di bin navûnîşanên cudan de didatin û didin bikehdîkirin û bixwedîkirin. Wer em tevde bi hev re û bi hemû karîn û tiwanên xwe ve divê em hemû ji bona Rizgarîkirina Welat û Miletê xwe ve careke din ji bona Serxwebûna Welatê xwe, malandina gemara bin tapanên Koletî û Bendîtîya Turk, Erebi û Faris ve, bi nemankirina Talankirina Dewlemendîtîya Welatê xwe û bi dawî anîna Komkujîtiya Miletê xwe bi Çekên Kimyayî û Biyolîcî ve bi vê Lîsta Rêbazê Barzanîyê Nemir ve bi hemû Payebûn û Serbilindaya Milî ve Dengê xwe ji bona bi serkevtina wan ve bidin bidan.

Pêşgotin

şerê Destûrê

Di her heft Salên bihûrî de Rijêma Esed dikir, gelek Caran bi Cemawerî yan bi Serbazî bikeve heger ne ji alîkariya Hevberên wê ba û mertalkirina wê bi hemî Hêzên xwe carekê li duv yan din û dema ku diçû Danûstandinên Cunêvê û Esîtane û Sûçî wêna armançdikir mifabûna Demê da vegere Hêzên xwe bide hev û Rêzên xwe rêxistin bike Ev Tişt xuyabû dema Qîma xwe ne tanî û ne diguhert Helwêsta xwe di Pirsgerêkên Serekê Rijêmê û Guhertineke rastî di Yasa binaxî (Destûr) yan Helbijartinên zelal dibin Serperîştîya Navdewletî de û iroj Rijêm pêşdikeve bi Piştewaniya Êros û Îraniyan di zorbeya Berên Şer de ,heye di Rojên nêzîk yên ku tên ta Berê Horan li başûrê Suriyê bikeve Di Rewşeka wiha de wê Rijêm Qîma xwe bi çî bêne û hemî Pelkên bi Hêz bide wê ne di Şerê Destûra nû de ya ku Dîmsitorî û Rûsiya pê dibakin bihevre Civînên Desteya bilind ya Danûstandinê li Riyadê di Roja sêşembê 26ê Tîrmehê de bi dawî hatin û di Encamê de Encûmana Neştîmanî kurd weke Hebûnek Serbixwe hat raghandin Cunêv li benda Geryanek nuh û germe ji Danûstandinê di navbera hemî Aliyan de ye û ya ji mere giringe di Radeya pêşî de ewe standina bihtir ji Mafên Miletmeyî bindest ji Rijêmê û Rêkberiyê herduwan , jiber ku herdu Rex wek ku Serbihûran esihkiriye du Rûwên yek Diravî ne li hember Doza Kurdî de , û dûvre biserketina Çespendina wan Mafan di Destûra Sûriyê ya nuh de Li vêde dimêne bê helbijartin Desteyek Danûstandinê Kurd Doblomatîke xurt xwedan şîyan di Hunera Danûstandinê de bikare bi hemî Erkên xwe rabe Lê Erkanên biserketina kîjan Projî yan Destûrî di vê gera Danûstandinê ewe Çendîn Aliyên navdewletî û Zilehêz Rastin di çespendina Encaman ên heye ku hersê Deste (Rijêm , Opozosion û kurd) liser lihev bikin Emê çavdêriya Rojan bikin û hêvîdarbin ku ev Herkandina Xwînê bi Dawî be bi duristkirina binaxê Welatekî yekgirtî Azad û Dîmoqrata ji hemî Pêkhatiyên xwere be û Taybetmendiya Miletê Kurd liser Xaka wî Dîrokî biparêze



ENCÛMEN



Pîroznameya Êzdiyên Sûrî ji bo boneya cejna Remezanê

Bi helkeftina cejna Remezanê, em
wek Encumena Êzdiyên Sûrî,

pîrozbahiyên xwe yên germ, arasteyî Misilmanên cîhanê dikin, ew yên ku bi pêkrejiyanê û
.mirovayetiye û bi Xwedê bawer in

Em Êzdî dibêjin

Hecaco meçe Hecê

Şimikan meqetîne bi rê

Hec ew e mala tu lê Anku mirovê bawermend, baweriya wî çi be bila bibe, ne mecbûr e perestîne, nimêj û rojiyan li perestgehan bike. Ev xaka ku em li ser dijîn hemî xaka Xwedê ye, û hemî pîroz e, û eger mirov di bawerî û perestina xwe de durist be, mirov dikarê perestina xwe li mala xwe jî bike. Riya Xwedê naskirinê ne ji perestgehan dest pê dike, belê ji dil û mejiyê mirovan û ji wê axa ku tu li ser dijî dest pê dike Eger em bala xwe bidin dîroka Misilmanetiye em dê bibînin ku tu carî Ol û baweriyên din nepejirandine, û her timî tundûtûjî li dijî wan bi kara anîne gelo çima Gelo Ol û bawerî tenê ji Misilmanan re hat Gelo hun tenê Xwedê nas dikin Gelo ma hun wekîlê Xwedê ne li ser riwê vê zemînê Yan jî Xwedayê ku hun pê diperêsin cudaye ji Xwedayê vê Gerdûnê Kurt û puxt, di welatên hemereng û pir Ol de yên mîna: Iraq, Sûriya, Misir, Libnan, ûhw. Ji ber tundûtûjiya misilmanetiye li himber wan, Pêkrejiyan û hêminiyê ciyê xwe di van welatan de nedît Eger em wisa lêvegerek bilez ji şûreşa Sûriyê re çêkin em dê bibînin ku misilmankirina şûreşê, yek ji sedemên bingeîn bû ku hişt şûreş têk here, her weha wêrankirina gelek herêman û koçkirina nişteciyên wê dîse sedem Misilmanetî bû, wek ku mînak Efrîn û tiştên ku anuha lê diqewime Bi vê helkeftina pîroz, bi hêviyên pir mezin bi dilên pir germ, em gazî aqilmend rîsipî û olnasên Misilmanetiye dikin, ku dengê xwe li dijî dengê tundrewan bilind bikin, û destê biratiyê mirovatiyê, hevûdin pejirandinê û pêkrejiyan ji bawermendên Olên din re dirêj bikin, daku em jî karibin mîna mirovan li ser xaka bav û kalan bi azadî û serbestî bijîn Careke din cejna Remezanê li mirovayetiye pîroz be

Ji hemî pêkhatên Sûrî re, pêkrejiyaneke hemin, azad û bi rûmet daxwaz dikin Hêvîdar in ku Xwedayê mezin hemî pakrewanên me bi dilovaniya xwe şa bike Dest bi dest ji bo Sûriyek ferehhizbî ferehbawerî Federal û demûqrat

Encumena Êzdiyên Sûrî

15-6-2018



Serhan Îsa

Kurd û Şoreşa Sûrî

Xeleka 2

Şoreşa Tûnisê û Buhara Erebi:

Şoreşên buhara Erebi, ji Tûnisê di 17.09.2010 an de, di bin navê Şoreşa Azadî û Rûmetê de dest pê kir, ku ew xwepêşîndanên gelêrî di bingeha xwe de bervedanî bû di ber Azadî û Rûmeta karmendê Tûnisî „Muhamed Al Bûezîzî“ de, yê ku di 17.09.2010 an de, û piştî Polîsa bi navê „Fadiya Hamdî“ Paytûna wî destgîr kir agir berda bedena xwe û hewldana xwekustîna xwe kir, û paşê di 04.01.2011 an de di nexweşxaneyê „Bin Erûs“ de giyan siparta Yezdanê jorî. Xwepêşîndanên protestokirinê li bajarên Tûnisê yên mîna (herêma Sîdî Bûzêd, Wilayet Al Qasrên, Al Meknasî, Al Rîqab, Sîdî Elî Ben On û gelek bajarên din) berdewam kirin. Xwestekên

xwepêşînderan ev bûn:

- 1- Çareserkirina rewşa kesên bêkar.
- 2- Tunebûna dadweriya Civakî.
- 3- Geşbûna Gendeliyê di nava Rêjîmê de.
- 4- Binpêkirina azadiya derbirînê.
- 5- Qedaxekirina hindek alavên ragihandinê mîna Facebook û YouTube

Tevî ku gelê Tûnisê di encama van xwepêşîndanên de gelek serkeftin bi dest xwe ve anîn, û her weha gelek Pakrewan jî dan, lê dîsa nerawestîya, û şoreşa xwe berdewam kir.

Serkeftinên destpêkê:

- 1- Serokkomarê Tûnisê „Zên Al Abidîn Bin Elî“ mecbûr kirin ku gelek wezîr Istifa xwe bikin, di nav de wezîr hundir.
- 2- Soz da xwepêşînderan ku daxwaz û xwestekên wan bi cî bîne.
- 3- Soz da ku xwe dûrî hîlbijartinên Sala 2014 an bikê.
- 4- Serbestkirina bikaranîna Facebook û YouTube.
- 5- Erzankirina buhayê hindek xwarinên rojane.

Lê gelê Tûnisê Şoreşa xwe nerawestand daku gihişte damûdezgehên dewletê, ku di dawî de Serokkomarê Tûnisê „Zên Al Abidîn Ben Elî“ mecûbr kirin, ku bi dizî û bi roj ne bi şev ji Tûnisê bi alîkariya Istixbaratên Lîbiyayê di 14.01.2011 an de bireve Erebiştana Si'ûdî.

Di bawerîya min de, Fakter û hîmên biserketina şoreşa Tûnisî ev bûn:

- 1- Leşkerê Tûnisî biryar da ku li dijî xwepêşînderan şer neke û tundûtûjîyê bikar neyîne.
- 2- Emerîka hîna ne amade bû ji desttêwerdan û destdirêjîkirinê di gewdê vê şoreşê de.
- 3- Gelê Tûnisî dikarîbûn baş Mediya ji bo şoreşa xwe bikaribînin.
- 4- Newêrekiya Serokkomarê Tûnisê „Zên Al Abidîn Ben Elî“ ku înan bi rebê xwe anî ku wê dawîya wî li ser destê gelê Tûnisî be.
- 5- Yekîtiya Ewropa helwesteka alîkar û dostane dan, bi taybet Ferensa dema ku red kir ku Serokkomarê Tûnisê derbasî welatê wê bibe.
- 6- Yekîtiya dewletên Erebi di şêlûbêlî û metirsiyaneke mezin de bûn, û nizanîbûn çi diqewime.
- 7- Netewên yekbû li ser devê Ban Kî Mon piştgiyariya xwe ji gelê Tûnisî re diyar û eşkere kir.
- 8- Herdu mezintirîn û bi hêztirîn dewletên Erebi Misir û Erebiştana Si'ûdî helwestek nerm û hekîmyane dan.



GOTAR

4



Jmar (4)



Emer isma'il

Turkiya çî ji Sûriya û kurdan dixwaze

Ji destpêka ku şer berî heşt salan dest pê kir, ji hingî ve Turkiya bi hesanî nêçirê dike, û ji xwe re serzemîn û binzemîna perçenan ji xaka Sûrî didize, û rolek giring di biryar û nêrînên siyasî nexasim opsizisyona bi renekî gelekî qirêj û gemar bo nimûne bazirganiya wî ya navnetewî bi penaberên sûrî, di bin gefa de ku derî li

penaberan veke û berê wan bide Ewrûpayê bi milyaran dolar ji Ewrûpayê werdigre; peyman bi yekîtiya Ewrûpayê re emze kir di vê derbarî de. Û bi siyasetek dûr nêrîn l i nexşeya nû ya Sûrîyayê di xebitî û bi sedema barastina welatê xwe ji DAÎŞ û tirotê derbasî xaka Sûrîyayê bo li ber çavan û alîkariya hêzên nav dewletî di serê wan de Amrîka naxasim der barî kurdan û mafê kurdan divê qunaxa dîrokî û girîng de û EStratîjiya Turkan di destpêkê de hate xuyakirin; ew jî ew e ku nehêle Kurd li hemî parçeyên Kurdistanê mafê xwe yê netewî û çarenûs wergirin , ji ber vê yekê êrîşî Kurdistanê Sûrî dike bi hemî hêza leşkerî û hêza Hemahengiya Niştîmanî li ser Efrînê Bê guman êrîşa weha dijwar dijî Aferînê bûka Kurdistanê bi renekî hovane, û welatên cîhanê jî lê temaşe dikrin û alîkariya wî dikirin ji rexê leşkerî wêrankirin û talankirin ta nûha roj û şev û bê rawestan dewleta tirk a dagîrker guhertina demografî li Aferînê pêk tene Ereban û tirkan bi darê zorê li ser mal, xanî û zeviyên bicih dike bê guman ew hêza pyd ya ku alîkariya Turkan dike binavê parastina Efrînê ku lê bi rastî û liber çavan eşkere kir ku wan Efrîn firotin Turkiyê piştî wêrankirina wê û bombekirina Xaniyan û kolanan û malê hev welatiyên sivîl û girtiyên di zindanan xwe de radestî rijêmê kirin Li gor Turkiya (Şoreşa) sûrî gihîşte armanca xwe her wiha ber dewam dike di pêş ve çû na wê di xaka Sûriyê de ta kihşte Minbic bi peymanek bi Emrîka re. ev diyar dike ku di rojên pêş de nexşeya perçekirina Sûriyayê diyar dike û tirkî di xakê kurdista Sûriyê ber xwe bixe bi peymanek navdewletî û armancên xwe pêk bîne.



Helbijardinê Komara Kurdistan û Xewna Mondiyalê!!!!....



Ra'îd mihemed

Di cîhanê werzişê û sporê de lîstikên corecor hene û xwedî cemawerên mezin in , lê hatiye naskirin ku goka pê yan jî Futbolê lîstika herî bi nav û deng e û werzişa herî bi hêz û kelecane û cemawerên mezin lê temaşe dikin û guhdar dikin , di vî warî de Qehremaniyên corecor hene li ser astê cîhanê , lê ya Cama Cîhanî ya naskirî bi "Mondiyal" ya herî xweş e û şopêngerê wê bi Melyonan e , ew Helbijardinên Nîştîmanî têde beşdar dibin ku 32 tîm in , li ser Camê dilîzin û rikberiyê dikin , bihtir ji Ewropa na û ji Emerîka Başûr in , ji ber heya niha tu tîm yan taxim ji Asya yan ji Efrîqa yan ji Emerîka Bakur bi ser ne ketine û Cama Cîhanê na hildane , û ji ber ku Kurdistan me serxwebûn ne standiye û ne bûye Dewlet , tîma Kurdistan nikare

beşdarî Cama Cîhanî "Mondîal " bibe ji ber ku Şert û merca FIFA ya ku serpereştiya gokê dike wiha ye , nabe ku tîmê herêman beşdar bibin , yan neteweyên ku dewleta wan ava ne bûye , ji ber vê yekê taximê Herêma kurdistan di Qehremaniya Herêman de beşdar bû û carekê bû Qehreman , lê xewna mezin ew e ku di Mondiyalê de beşdar bibe û Alaya Kurdistanê were bilindkirin di nav alayên Cîhanî mîna Ercentîn û Berazîl û Elnanya ..htd .û ji ber neheqî û dadweriya bînpêkirî hişt tîmên mîna Ayslanda ku hejmara nişteciyên wê digihin 340 hezar kes ku hejmara Xelkê bajarê Duhokê jê bihtir in , ji ber vê yekê xewna 50 melyon kurd e ku taximê Kurdistanê bighe û beşdarî Mondiyalê bibe, ku ji slal 1930î yekemîn Mondiyal çêbûye li Oroxway û Van rojan li Rûsya mondiyala 2018an tê birêve birin , ku ji sala 1930 heya niha Taximê Berazîl 5 caran bûye Qehreman û taximê Italya û Elmanya her yek ji wan 4 caran bûne Qehreman û Ercentîn û Oroxway her yek ji wan 2 caran û Ferensa û Ispanya her yek carek bûye Qehreman , erê tu tîm yan taxim ji Asya yan ji Emerîka bakur yan Efrîqa yan ji Oqyanosya ne bûne Qehreman lê ew xewna her yekî ji wan e ku Cama zêrîn hildine jor û alaya niştîmanî bilind bibe û navê welatê xwe bide xuyakirin , ji ber vê yekê û di vî warî de gelek yaneyên Werzişî li her çar parçeyên Kurdistanê hewil didin ku xwe li pêş bixin mîna yana Cîhad û Efrîn û Cezîre li Rojavayê Kurdistanê û yana Amed sport û Dîlok û Orfa sport li bakurê Kurdistanê û yana Zaxo û Duhok û Hewlêr û pêşmerge li başûrê Kurdistanê û yana bane û kermanşah û ûrmîyê li rojhilata Kurdistanê ., ku hin ji van yanan lîstikvanên mezin derxistin û di taximê Sûrya û Tirkiya û Iraq û Îranê de lîstin ji ber ku Kurdistanê ne dewlet e , û hin lîstikvanên kurd li ser astê cîhanî berz bûn û navê wan belav bûn mîna "Mesûd Ozêl " ku bi tîma Elmanya re sala 2014an Cama Cîhanî hila , û li başûrê Kurdistanê lîstikvan Hewar mela Mihemed hate xuyakirin û bi taximê Iraqê re Qehremaniya Asya sala 2007an stand û Cama Asya hilda jor li gel Selam Şakir , û li bakurê Kurdistanê gelek lîstikvanên kurd hatin xuyakirin bi taybetî sala 2002an ku bi tîma Tirkiya re lîstin û karîbûn di rêzbenda 3an cî bigrin mîna lîstikvanê binav û deng Hesên Şaş , û li Rojavayê Kurdistanê lîstikvanên kurd yên ku li ser asta Sûriya di rêza yekemîn de bûn mîna Fener haco û zana haco û Heysem kiço û Comerd Mûsa û Samir se'îd û lîstikvanên dî , û heger em berê xwe bidin parzemîna Ewropa ku demoqrati û azadî bihtir e , yaneyên kurdî hatin avakirin mîna " Dall Kurd FF " ya ku Alaya Kurdistanê kiriye sembola xwe ku di sala 2004an hate û di pileya 7an lîst heya ku di sala 2018an kete di pileya 1ê de û beşdarî Lîga Siwêdî bûye û wê di rojên bê de lîstikvanên mezin û bi hêz derxîne , wiha tê diyarî kirin û hêza kurdî û lîstikvanên kurd hatine belav kirin li Cîhanê û hîn Xewna Taximê Kurdistanê di dilê sportvanên kurd de ye.



DAXUYANÎ



Jmar (4)



Daxuyanî

Di derbarê sûciya şeva xezebê li kobanê di salvegera sêyemîn ya komkujiyek dijar de ji hêla çeteyên da'îş yê terorîst ve li kobanê hate kirin. di şeva 25 / 6/2015 an de ku bi sedan qurbanî ji şehîdan yê ku piranî, jin û kal û zarok bûn. Ev gunehkariya ku di asta sûc û tawanbaran de li dijî mirovahiyê zêde dibe, û rewşên wê hîn jî vê hejmarê û tevlêbûna van sûcên xwe yî dojahî bi çekên xwe re dorpêç dikin û welatîyên parastî neheqî dema ku bajêr binçavkirin bû û hemû hêzên leşkerî yê ypg û Asayîş pyd biparêze û li ser berpirsiyariya geştiya dikevîte di parastin û ewlehiya welatîyan û ji ber ku ji roja bi riya xwe de komkujiya to date kir pyd li ser şert û mercên vê bûyerê dilşikestî û xemsarî û kesên berpirsiyar ji bo wan êşkere ne, wek ku ew di dema nebûna dem rû û veşartî û ji bîr bû, lê xemgîniya di dilê gelê qurbanîyên bêguneh yê dimîne Heta ku rastiya nepend de. Encûmena Nîştîmanî ya Kurdî di dema dubare şermzarkirina sûc şevê ji îxanetê bi tundî, wek hewldana PYDpanteîst rastî û xizaniyê ji bo êşkerekirina hemû şefafiyê di naskirina jiyana Alhhdahtrama ji hestên dê û bavê xwe, û piştrast dikin ku malbatên şehîdan ku rastî wê bê û Alaadalhsov bigirin, bêguman wê çi qasî dirêj Bi dilsoziya şehîdan Şerm û şermê Ji . bo kuştin û sûcdaran

Emîndariya Giştî ya Encûmena Nîştîmanî
Kurdî

2-6-2018



Daxuyanî

daxuyaniya ji aliyê Emîndariya Giştî ya Encûmena Nîştîmanî kurdî ya li ser tiştên ku li herêma Deraa * daxuyaniya ji aliyê Emîndariya Giştî ya Encûmena Nîştîmanî ya li ser tiştên ku li herêma Daraa diqewimin * A herêma mertalê rastî bombebaran li ser welatîyên sîvîl barbarî û hewa ji aliyê rejîmê û hevalbendên xwe, û ji ber ku bi sedan koçber bi hezaran sîvîl di nav çolê bê stargeh, bi piranî zarok, jin û şkal..bê ku hêzên navneteweyî bédeng bike û ji bo parastina wan re ne.

Encûmena Nîştîmanî ya Kurdî vê tewembariyê şermzar dike van êrîşên tundrew li ser xelkên Deraa û bang li civaka navneteweyî ji bo çaresariyekê ji bo şer û vegera welatîyên sîvîl ji bo malên xwe û dayîna xizmetên û pêdiviyên û ji bo çareserkirina rewşa li welêt krîza di rêya biryarên navnetewî yê ne bi awayên leşkerî .

Em bi lezgîniya çareseriyê û çareserkirina kêşa Sûriyê, ku ji hêla xwerûya navneteweyî ve tête serdest bû, ew dewletên bandor ên wê yê ku bandorkirina xwînê, hilweşîn û hilweşandina avahiyên sîvîl û aborî û tengahiyên giran bisekinin. Emîndariya Giştî ya Encûmena Nîştîmanî ya Kurdî li Sûrî, 5 Tîrmeh 2018



RAPORT

7

Jmar (4)



Salvegera komkujiya Amûdê Encûmena Nîştimanî kurdî ya xocehiya herêma Amûdê . di salvegera komkujiya li Amûdê di 06/27/2018 li dar ket, dema ku hêzên YPGê yên girêdayî Partiya Yekîtiya Demokrat PYD derdiketin, ji bo kuştina şeş kesên sivîl li Amûdê û dehan piştî guleyan birîndar li xwenîşandana aştîyane û doza serbestberdana hin girtîyên ku di zindanên Partiya Yekîtiya Demokratîk. Bi sedan niştecihên yên li bajarê Amûdê û rêberên yên Encûmena Nîştimanî ya Kurdî çarşembîyê de piştî nîvro li 2018/6/27 Hramoula Avamoda Goristana civiya. Di destpêkê de demek bêdeng de li ser giyanên şehîdên, piştî ku serokê xocehiya Amûdê Abdul Wahab Carmi axaftina li ser bûyerê dilşikestî ji aliyê hêzên YPG yên Partiya Yekîtiya Demokrat lidarxistin teslîmî rawesta bû. Ji bo partiya wî, Hesen Saleh, Endamê Komîteya Siyasî û cîgerê Sekreterê Partiya Yekîtiya Sûrî li axaftina xwe da ku di derbarê şehîdên Partiya Yekîtiya Demokratîk de bi ser şehîdên xirab xistin axivî, riya şehîdên Kord û Kurdistanê dubare kir. Û paşê cem gorên şehîdan û li ser gorê ji her şehîdê vekin. Piştî endamên Komîteya Siyasî ya Abdul Samad Khalaf serokatiya Encûmena Nîştimanî axaftinek da ya li ser sûc û sûcên giran kir

sûc Di derbarê hilbijartina ku niha çêdibin li bajarê Sirûcê ya Kurdî Tirkîyeyê ew bû şahidê bûyerê wey dibirin, ji bo kuştina û birîndar ji gelek alîgirên Partiya Edalet û Pêşketinê li aliyekî û alîgirên Partiya HDP'ê li aliyekî din. Where çavkaniyên me re got ku, roja yekşemê, bi kurtî ji 24/6/2018 date tam saet yek pm kevintirîn namzetê Îbrahîm Xelîl Yildiz ya partiya Edalet û Pêşketinê, birayê bi komek ji alîgirên lokala hilbijartinê li Nishiki a kolanan bi navê (Kara) êrîşî hilbijêran xist û du kesên bi object min sivikatiyeke mezin bi kêran . Ev hêjayî gotinêye ku ev bûyer dewamîya vê bûyerê de ku cihê hefteya borî li bajarê girt ku çar kes di dema gera hilbijartinê ya namzetê ji bo ku desthilatdariya partiya Edalet û Pêşketinê hatin kuştin û heşt kesên din jî li Nishiki bajêr Kurdish dewletê Brive ya Rihayê (Rhea) zedekirî ku li bajarê Kobanê jî birîndar bûn, li guley Ku ew di dema gera kampanyaya, ku ew li van kêne kir ku ji bo namzetê xwe yên ku di hilbijartinên dihatû yên dengê xwe, dema ku xwediyan dikanan nexwestin ku bi dengê xwe ji bo wan »derket, a şerê di navbera kêne yên namzetê partiya Edalet û Pêşveçûnê, İbrahîm Xelîl, xwediyan dikanan di bajêr de. Ku ji bo kuştina birayê İbrahîm Xelîl, namzedekî ji bo Dad û Geşepêdanê û du xwediyan dikanan, wek birîndar 8 kesên din »di şerê teqina .otsaad dema ku ew ji navenda bajêr ber bi Navenda Giştî ya Partiya desthilatdar ya Edalet û Pêşketinê, ku dibû sedema birîndar Cîgirê di parlamentoya Tirk, İbrahîm Xelîl koçî birin baş namzetê ji bo hilbijartinan », û hin çavkaniyên piştrast kir, ku namzetê partiya« Erdogan yê ku dest bi teqeyê de



Hişyar Emerê Lalê

Yekîtiya me hebûna me ye

Ev şoreş û hêlanê rabîn û dirabin encama zilm û zordarîkî kevn e, millet vê zordariyê nema qebûl dikin ,ji ber ku mirin ji vê jiyane xweştir e ev jiyana bê rehetî û tengijî û tind û tûjî , lê tevî borîna zêdeyî hevt salan li ser vê tevdanêre derbas bîne ya ku navê wê kirîn şoreşa sûrî, çi encam daye ta niha û wê çewa bibê ? !..... Çi ji me tê xwestin em weku kurd xwedî maf û dijîn di vê rewş û bûyera nû de ??? Me di van salên borî de çi

kirye ??? Çima em evqas hişk û bê mifane ji hev re ??? Çima em herkesî qebûl dikin û hev qebûl nakin ??? Çima em di tiştên hevbeşde naghin hev ??? Gelek eger hene nahêlin ev pirsyarên me bê bersivbin . 1-pirbûna partên siyasî ne diyardek saxlemiyê di civaka meya siyasîde , çekirna partîkî siyasî biye modêlek nû her partîkî kevin piştewaniya vayê nû dikê û wan hembêz dikê ji bo bercewendên xwe yê partîtî her partîkî bîn çar qet û pênc qet , helbet piştewan û momewilên wan neban nedikarin berdeewambikin , ev diyarde li dare wê he diçin herême û tene pêşwazîkirin ji part û layanên siyasîve , pêwiste ev nexweşî bê çarekirin da em vê derfetê ji dest xwe neberdin, nemaze di vê qûnaxa hestiyar ya ku em têde gihane rewşek gelekî xerab. 2-Pêwiste ev partiyên wek hev li hev biguncînin û bibin yek da ku bikarin bîr û boçonên xwe ser hevde bînin. 3-hişyarkirina millet û civakê li ser van bûyera û rêveberiya vê qûnaxa nû berev beravekî aram û tenahî bi hişmendîkî bilind bi alîkariya hemî layana 4-Yekbûna bîr û boçona di mafê millet de û zelalkirina mafê kurda li hember hemî gelên sûrî , çi rijemê bê yan jê çi opozisyon .?? Pêwiste weku rêxistin , komele , nivîskar helbestvan û rewşenbîr yekbin û yek helwist û nêrînbîn li hember dijmin û neheza û divê hemî di vê biryara mesîrî de beşdarbin li gor berpirsariya xwe ya dîrokîbin ya ku erkek netewiyê dikevê ser milê me hemiya . .gotina yekîtiya ya ku em hemî bîr û baweriyê pê tînin lê em nakin ji ber ku yekîtiya bercewenda kesên ezezî naparêzê ji ber vê yekê gelek hene li hember yekîtiyê disekinin bê şerm û fedî . Parçebûna tevgera siyasî ya kurdî dihêlê lawazbê li hember opozisyonê û her weha li hember dest hilatê jî , tevgera kurdî ya sûrî ta niha hê nêrînek yekboyî û zelal diyar nekirye , ji lewre di nakokiyên mezinre derbasdibin nemaze di vê rewşa hestiyarde ya ku hemî rewş û nîşanên wê pêwîstdikê ku em yek dest û helwîstbin . dem hatiye neberdin rewşê te guhertin divê em jî li gor dem û rewşêbin yekîtiya xwe mukumbikin nêrîn û boçonê xwe serhevde bidin ji ber ku bercewenda meya herî giring yekîtiya meye yekîtiya nêrîn û boçonê meye hingê emê bikarin bighin encamin baş.



ÇAND û HUNER

9

jmar(4)



Serdana sersalê dest pê kir.

Ferhad şêxo

Serdana sal berî destpêkir By Mahmoud Ayoub, Berpîrsê Têkiliyên Derve li Komîteya Mafên Mirovan a Sûrî (MAF). Malbata bêbawer bûn. Dayikên cenazeyan winda kir. Mirovan mal wenda kir. Kesên ewleh xaniyên xwe û çavkaniyên wan winda kir. Û mîlyon kes di erdê de Taha bi tenê dawîya Xwedê dizane. Hinekan hişê xwe winda kir. Gelek prensîbên xwe hene. Û hinek olî .. Tengahiyek dewlemend an jî xerîb nas nakin .. Derbasdar an invalid .. Çirên dilên dil û nezaniyê .. Cenazeyê Ji bo me fêmkirina veşartî, paşê rabû û lê baxwazî Û li rojavayê xwe digerin .. Ji bo guherîna xwe bikin û li her derê ku her tiştî ye û firotina firotanê bişînin .. Û ji me re, bêhtir bêhtir bêhtir di

Mehmûd Eyûb

parçeyek xistin .. Û em ê ku zimanê xwe dest bi rêberî dora xwe rêberî kir û ew ji bo qenciye bangî .. Û ji me yê ku piştî salan ji hêla rast de dimîne .. Û em ji bazirganê xulam û welatek e. Ji me re şehrezdar kir. Bi zehmetiya dilên dayikê veqetin ... Û çavên mirovan digirîn .. Piştî van salan Ma me çi guhertin? Gelek bi xwe guhertin. Gelek di kelek nezaniyê û parçeyên xerabiyê de ditirsin. Tevî piraniya şerê şer, mesref, winda û mirinê ava kirin. Gelek kes winda û winda kir. Piştî van salan Em pêdivî ye ku bitikînin .. Ma em wateya ku ji vê xemgîniyê veşartin? Ma em fêm dikin ..? Ma hişyar e? Yan ê em ê bimînin. Hingê em dibêjin, Ya Xudan .. Bersiv tê .. (Yezdan naxwazî mirovê ku guhê xwe ji wan re biguhêrin) Ya Xwedê, em bersîva teşeyek xweş ş.

Qamişlo îro pir xemgîn e bê denge...

Dr Ezîz ferman dr ê dilovan û rêzdar û welatparêz Em tucar te jibîr nakin heya ku em bixwazin . Ji ber ku nexweşxana Ferman cihê te ye Ew cihê jî ji bo me bû cihek dîrokî û tu tim tê de zindî yî Li wir zarokên qamişlo hatin dunya yê Û ew zarok bûn bav û dayik û bapîr û dapîr Li wir şehîdên qamişlo hatin dermankirin . ew şehîd ji zarokên wê nexweşxanê bûn Mixabin dilê te yî pak rawestiye û te xatir ji me xwest Lê em tucar nikarin xatirê ji te bixwazin ji ber ku hîn dilên me hemiyan ji ber te lêdkevê .

Şêrê berzan

Ev dilê li ser mile Min daniyê barê giran
Ev gelê ku li ber xwe Dide bi sedên salan
Ev welatê zîv û zêrîn Ewe her bûka cihan
Hiş û hestê min biriye Şev û rojê bê hedan
Ev gula ku min avdida Bi çiravê çilmisî
Ew sitêra min bijartî Şev û rojê d'çirisî
Gul zuha bû, pel Weşandî, mirisî
Çi kim îro ew sitêr Jî, ji ber sêrmê qerisî
Hêvî û omêd nemayê Bilî şêrê ji berzan
Xwîn rijandin li her alî Kur û keç, xortên ciwan
Xwe nefrotin, xak buhayê Ne wek ew kesên erzan
Li sre şopa bav û kalan Yan Kurdistan, yan neman
Qamişlo 6/7/2017



Dr. Ebdulêzîz ferman



WÊJE

10

Jmar (4)



Melayê Cizîrî

Şêxê aşiqan e

Li Cizîra Botanê keleha zanîn û toreyê ,Melayê Cizîrî ji dayikbiwe ,ev helbestvan û aşiq di zanistên olî û dinyayê de deryayekbû.û bi hiş û ramanê xwe bi pêpelûka işqa xudayî ve çû.

Û cihê şanaziyê ye ji wî re ku bi navê şêxê aşiqan yan jî mirê evîna xudayî bête nasîn.

Selam Darî

Navê wî Ehmed e kurê şêx Muhemed e, bi navê Melayê Cizîrî di hat nasîn,ji ber ku ji Cizîra Botanê bû Nerînên dîroknesan di dema zayîna Melayê Cizîrî de cîwazin,lê bi gumana min di sala 975 mişextî ku beramberî 1567-1568z hatiye dinê,û di sala1050 mişextî ku beramberî1640z çûye dîlovaniya xudê.

Ew bixwe ji eşîra Bextiyan e ev eşîr li Cizîr û derdorê wê belv e.

Xwendina xwe li hin dibistanên Cizîrê kir,û di pêre li Kurdistanê geriya ta xwendina xwe li ser destê hin zanyaran tewa kir,û bawernama xwe bi jîrbûn bi destxist.

Di dûre mamusteyî di hin dibistanên Cizîre de kir,paşê bû mamusteyê dibistana sor ya ku tirba wî jî li wê ye. Melayê Cizîrî ji mezintirîn helbestvanê Kurd tê jimartin,ji ber ku di ristina helbestê de şarizebû,sedemên serkeftina Cizîrî di helbestê de gelek in :

1-Melayê Cizîrî bi zimanê Erebî û Farisî û Kurdî û Turkî jî di zanî.

2-di hemû beşên zanîne di dema xwe de jîrbû.

Û ev zanist di helbestê wî de diyar dibin.

3-haya wî ji dîwanên helbestvanên Farisa yê mezin hebû mîna şîrazî û Se,dî û Camîûhd.

4-ew bi xwe ji Cizîra Botanê bû ,û zaravê Botan li nig Kurdan zaravekî standar de , mîna zaravê Qureyş e di zimanê Erebî de.

5-bû aşiq û êş û azarên evîne dîtîn,û pêşengbû di evîna xudayî di toreyê Kurdî de.

6-ew bavê helbesta Kurdiye ji ber ku kêşeyên kilasik yê helbestên Farisî û Erebî derbasî helbesta Kurdî kir.

Bi vî awayî Melayê Cizîrî xwe da xuyakirin ku helbestvanekî teke bi şêweyê xweyî helbestî,û bi evîna xudayî,vêce di helbestê de dahênerbû

Û Melayê Cizîrî bû simbolek ji aşiqan re,û helestên wî wek neynikekê ne ku rewşenbîriya wiyî ber fireh berçavdikin.



ÇÎROK

11

Jmar (4)



Luaman silêman

Şemdîn û hemdîn

Xeleka 2

Her bîst û pênc Mîreka li hevkerin bi telaqê ku jin diçê mala bavê bê veger sînd xwarin ku kes ji sînda xwe venegerê. Dane xwe rabûn berê xwe dane dîwana Hisên axa yê delo dîn bavê Şemdîn çûn li odê rûniştin teva serê xwe bera ber xwe de û bi darikê xwe pêşiya xwe xepirandin wensa xwe bi darikê xwe anîn ta ku Hisên axa ji aliyê malê hate odê. Dema ku çav li wan

kir serê teva di ber wan deye û bi darikê xwe dilîzin. Hisên ma behitî ji wan re got ha lawo min we xêre ez sax li darê dinê piştî çavê Ehmed axa bavê Şemdîn o insane li darê diniya yê hene ku pêstûriyê û tehdê li we bikê? Zilama jêre gotin ji xwe te û bavê Şemdîn o mala me li mîratê gerandiye vê zilma ku hûn li me dikin em hew zanin em di nav bera we de gêj û şaş bûne em nema di zan in çî bikin û bi al kî ji we bikin.. Hisên axa yê delo dîn go xêre lawo min? Zilama lê vegerand bi xwe dê em nikarin tişteki bikin yek ji we xwe bikin axa da ku em zanibin kî ji we axa ye û werin li oda we rûnin û zanibin bi were biştexlin em nizanin kî ji we axa yê meye pîrek pîreke bi di mêra nabê lê belê zilam bi dijina dibê di vê yek ji we li şûna yekî ji we rûnê. Emê herin oda wî wê bêbextiya di stûyê texê û li ser te baxivê ji aş û baja bînê wele em ji ber gotinê wî li ber xwe dikevin emê werin oda te tê li ser wî biştexlê em bi were mane heyîrî em hatine tu ji mere çarekî bikê. Hisên axa yê delodîn ji wan pirsî ka ji min re bêjin ka birayê min çî li ser min gotiye lawo min? Zilama jêre got bi qesema navê xwedê şevêdî em li oda wî bûn tişteke nema li ser te ne got bi xwedê heger ku em wan gotinê wî ji tere bêjin tê niha rajê şûrê xwe û êrîşî oda wî bikê di cîde tê serê wî jêkê. Hisên axa go erê ka ji min re bêjin çî gotiye li ser min?

Zilama jêre got bi xwedê gotinê ne di rêdene û em nikarin wa gotina di hizûra te de bêjin axa..

Hisên axa bala xwe baş da wan Hisên bi xwe pir bi aqil bû tiştê ji hev derdixê baş dizanê yê li pêşiya wî çî jêre dibêjê û çî jê di xwazê. Hisên baş dêna xwe da zilama ji wan re got ez bawer nakim ku birayê min Ehmed tiştê ne di rêde li ser min bêjê heger raste hûnê gotinekî ji gotinê ku wî li ser min gotî bîn in bihêlin ez ji we bawer bikim yek gotina ji gotinê wî ji min re bêjin?

Zilama ji Hisên axa re got bawer bike rûyê me nîne ku em wa gotina li ber te bêjin zimanê me li pêşiya te nagerê em ji ku dikarin wan gotina li ber axa yê xwe bêjin..

Hisên axa yê delo dîn li ser wa şidan got hûnê tiştina ji min re bêjin yan ez ji wer bawer nakim?

Simaîl go wela basa namûsa te dikir û basa kuştina te dikir û ne dûre ku ji kerrî de te bi kujê ya baş ewe ku te haj xwe hebê tu nizanê axa male diniya yê biratiyê kurdikê.

Hisên go wilo? Zilama go belê wilo. Hisên axa bakir go gelî Mîreka ezê bi Zozanê jorî diketim wê bi çîman û bi simaqa ez bi aniya bavê xwekim ev şêwra we şêwreka bêbomane hûn hatine we soz û telaq bi hevdûre dane hûn bi hevdûre bi tifaqin hûn hatine dibêjin em axa tiya Ehmed axa bavê Şemdîn axa yê delodîn li ser serê xwe qebûlnakin. Gelî Mîreka ezê bi Zozanê jorî ketime bi çîman û bi simaqa bi sê telaqê ku jin di çê mala bavê veger û galegal û



HELBEST

12

Jmar (4)



Çûkê çerxa nû

(Çûko çûko were vir min çêlîka te nebîr
dengête gelek xweş e ez li te naxim bi kevir
Çûko çûkê sor û zer Te ji hêlînê nakim der
Hêkê te naşikînim bi serbestî here wer
Çîv çîv çîv çîv aferî aşî xwazî li her derî
bijî bijî wek hevî Jiyan xweş e bê şerî

(Piçûkên dibistanê)

piçûkên dibistanê bixwînin gulîstanê
ji bo we amade ye hin ji çîçekên jîyanê
fermo bo we diyarî helbestê kurde warî
ey şêrên rojên li pêş zarokên kurdistanê
şîr anî pez kom kirin li banî
berx berdane ber bimakê
Her yek dayka xwe naskê
Bû mame'a berx û dê
Xweş wêneya em li bendê
Bêrîvanê şîr anî va malxwê û va kebanî
çortan û nîvişk û dew û mast keyandî
bi meşkê Lorik penîr û jajî
ma ev hene li mala kê Bêrîvanê şîr anî
Pez komkirin li banî



Haşim Şêx Zahir





HELBEST

13

Jmar (4)



jîn û buhişta min kurdistanê

Buhare himbêza wê zozane Mixabin li bin destê

Qelen buha ye can û xwîn jê re arzane

Ax buhar kengî tê bê Ji nûv re şînbikî

gula evîna muhemed şêxo Xunaveke hênîk bibar

bi gotin helbestên seyda yê cegerxwîn Jiyane ka nû bidî

çîroka mem û zîna Ehmedê xanî Ax buhar ma kengî tê bê



Azad mustefa

Navê kurd û kurdistan min ser dilê xwe danî

Bi awazê jîna xwe bi van rengên ciwanî

Bi xwîna dil min kola Bi nexşê zêr û manî

Bi tîpên zend evista bi rengê şaristanî

Li dîroka kevnare Ji mîdî û mîtanî

Newroza me li dare Ser çiya agir danî

Xemla welatê mine Dermanê dil û canî

Rengê xwîna şehîda pêşmerge û şervanî

Ev surîştê pir ciwan Bi kulîlk û rîhanî

Rengê ala mina geş Pirpir dikê li banî

Çi welatek buhayê bi surîşt û samanî

Bi zêr û paxir xaz bi nîsk û dextl û danî

Pîroze welatê me Bi navê kurdistanî



Hîşyar Emerê Lalê



CIVAK

14

Jmar (4)



Gotinên pêşyan

- 1-Aşê nezana ji xwe berê digere
- 2- Av çiqwasî di gola de bimîne genîdibe
- 3-Anî ji deriya da xêra miriya
- 4-Axa jin û mên ne ji hevbe bi hevve na gere
- 5-Axe tere xulam serxweşe
- 6-Aqil tune kêfdike bustan tune eşêf dike
- 7-Avaya gund ji panbûna rê de xuyaye
- 8-ber hevalê xwe dixê
- 9-Ar arê qurma ye
- 10-Aqil mamîş kundir qamîş
- 11-Agirê bi dûman tirsê jê meke
- 12-Agir bi Erdê dikeve ter û hişk tevde dere
- 13-Agirê mala xwe bernede mala cîranê xwe
- 14-Avê ku da serî çî bihostek û çî çar tilî
- 15-Axa bi deh gundê xwe ve bawer dike key xisrowe
- 16-Ava hêdî hêdî me ecêb jê dî
- 17-A dinê li dinê ye û A gur jî li bizinê ye
- 18-Ap birazê dadike û xal xwarzê radike
- 19-Aqilê qûnê heba tîr ne dikir
- 20-Aşiq birçî dibin nanê daweta di bîra xwe de tînin
- 21- Aqilê heft pîreka di serê Mirîşkekê deye û serê wê Mirîşkê di gû deye
- 22-Ava bîra bi tevdîra
- 23-Aqil taca zêrîne li serê her kesî danîne
- 24-Anî aşê bexşo
- 25-Adar dew li dar ne li vir li kewkeb û sincar li cem Şivanê xumal û kevaniya kar û bar
- 26-Adarê berf hat gulyê darê nema heya êvarê
- 27-Ava çema bû şîr tat nebûn Eşîr
- 28-Agir axe ye
- 29-Axa sar deng jê nayê
- 30-Aşê nezana çetire ji Ê zana
- 31-Aş çûye , çeq çeq maye
- 32-Aqil di serî deye ne di riyê deye
- 33-Axa bi xulame û xulam bi tentûre
- 34-Aqil bi pera nayê kirîn
- 35- Ardê xwe bêjing kir bêjinga xwe bi darde kir
- 36- Agir bi agir nayê vemirandin
- 37- Av û ar tu car nabin yar
- 38- Ap pismame , xal xwarzêye
- 39-Aqilê sivik barê girane
- 40-Aqilê wî ji kîsê hevalaye
- 41-Alif çêkir berî Hespê bikire
- 42-Aviya kulîlkê ye
- 43-Aşiq û daweta Aşiq
- 43- Agirê berdayî bihna pîşo jê tê
- 45- Agir davêje xwe û dibêje min ha ji xwe nîne



Ebdusemed mehmûd

Bajarê tozê...

Sibeh li kolana bi xricir in Xewn
matmayî dizîvirin Rêbar xwe li
rewrewkan digrin Pasportên bajarê tozê
werdigrin Li qiraxa kêstekên yasya yê
vedîşêrin Pîştê didin oxirê Kevokên spî
diperpitin Gulîsor teht an diwerivîn
Biyaniyên nenas jî bê durv in Heveş
bênderan di pîvin Serî xistin wê pirê Li
bajarê tozê Zerî bê gulav in Pênûs bê
ximav in Rî spî bê semax in Berhem jî
kimax in Deng naçe ji bilî birbirê Her
roj û ji her kêlîkê Di zeviya çavên te de
Berxwedana evînê diçînim Sirûdên
kalemêran Di riya revê de paşmêran di
afirînin Hooo şivano awazê bilûra te jî
Hew çivîkan dilerizînin Li bajarê
....tozê mûzîk qedexe ye